



ŞEŞ GAVÊN RAWESTANDINA BELAVBÛNÊ BO DANIŞTVANÊN ŞÛNÊN MIQAYITIYA LI ÎXTIYARAN (kesên pîr)

Spas bo alîkirina ji bo selametiya xwe, hevdaniştvanên xwe û hemî kesên li we miqayit. Em ji dijwarbûna rewşê û guhertina mezin bo hemiyar haydar in.

Selametiya te û başbûna rewşa te grîngtirîn tişt e bo me. Tevdêrên me bi cîh kirine ji bo xatirê selametiya te ne.

Grîng e em hemî domandina her tiştê ji dest tê bikin bo parastina daniştvanên şûnên miqayitiya li ixtiyaran û karmendan ji COVID-19. Agahiyên li pêş jî ji bo selametiya û rewşbaşiya te ne.

Ger derheqê tişteki de xemgîn î, yan bêtir agahdarî ji te re divên, tika ye bi endamên malbatê re, bi lêniheran re, yan bi karmendan re bi axafe. Ev mijar me hemiyar eleqedar dike.

Bêtir agahdarî li vê malperê hene: www.health.gov.au, yan telefone Xeta Neteweyî bo Alîkariya Derheqê Vîrosa Korona de bike: 1800 020 080.

Şeş gavên bo dawîdana belavûnê:

1. Karmendê miqayitiya li tenduristiya xwe agahdar bike ger nexweş bî

Divêt karmendê miqayitiya li tenduristiy xwe derheqê hemî şanên nexweşiyê de agahdar bikî, çîqa sivik bin jî. Ew ê biryarekê bigirin û heye ku te ji bo COVID-19 têtst bikin (mu'ayene). Şanên COVID-19 dikarin wek yê sernagirtinê yan zekemê bin û van şanan dikarin di nav de bin:

- himma (germahî)
- kuxîn (kuxik)
- tengbûna nefesê
- êşa gewriyê
- serêşî
- nebûna bêhnkirinê

- nebûna ta'mkirinê
- zêdebûna ava ji poz (bêvilan)
- êşa tamaran
- êşa mofirkan
- navçûn
- gêjbûn/vereşî
- nebûna meraqa li xwarinê

Têstkirina bo COVID-19 bo hemî daniştvanên şûnên miqayitiya li ixtiyaran heye.

2. Destên xwe pirrcar bişo

Divêt destên xwe baş bişoyî. Ev grîng e her ku peywendiya te bi daniştvanên din re, bi mêvanan re yan bi karmendan re hebe, pêş dîtina wan û dû re. Divêt destên xwe bi sabûnê û avê bişoyî, bi kêmasî bo 20 saniye. Ger destên te ne gemarî bin, dikarî maddeyêke bi bingeheke alkoholî (*hand sanitiser*) bi kar wîni.

3. Miqayitiya li xwe û mêvanan

Da ku bo rawestandina tehlûkeyên belavbûna COVID-19 alîgir bî, em pêşniyaz dikin ku tu:

- ji mêvanên xwe bixwazî bila nehên serîlêdanê ger nexweş bin
- wîni bîra mêvanên xwe bila destên xwe bişon û raber wan ke ka dikarin li ku bişon
- bila her carekê du mêvanên te hebin
- mêvanên xwe di odeya xwe de bibîne, li şûneke li derve, yan li şûneke ku navenda tu lê xuya kiriye
- bi mêvanên xwe re neçe şûnên bo koman
- her dem jihevduyî bi kar wîne (em dizanin ev ne hêsan e, bi taybetî bo neviyên zaro)
- bipirse ku mêvanên te di nav 14 rojên çûnî de nêzike kesekî ku COVID-19 pê re heye nebûne

4. Tu rêberiyên şûna tu lê bo mêvanan danîne dizanî?

Şûnên xizmetên miqayitiya li ixtiyaran divêt karê xwe ligor rêberiyên hukûmeta wîlayetê (*state/territory*) bikin. Her şûna xizmeta miqayitiya li ixtiyaran rêberiyên xwe hene bo alîkirina derheqê rawestandina belevbûna vîrosê de. Miqayit be ku tu û mêvanên xwe ji wan rêberiyên haydar in. Van rêberiyên dikarin werin guhertin ger haletên COVID-19 li herêma te hebin.

Pêş têketina şûna te ya miqayitiya li ixtiyaran mêvanên te divêt:

- bersîvên hinek pirsan bidin, da ku karmend tehlûkeya bi COVID-19 re eleqedar bidin ber çav
- raber bikin ku derziya xweparastina ji zekemê ya bo sal 2020 li xwe xitine (*flu vaccination*)
- bipejirînin (qebûl bikin) ku dê ligor rêberiyên bo mêvanan bikin

Ji mêvanên xwe re bibêje bila bersîvên durist bidin, bo rêbirrîna li belavbûna vîrosa COVID-19.

5. Dizanî çawa bi yê ji xwe nêzik re peywendîgir bimînî ger nikaribin werin serîlêdanê?

Heye ku şûna te ya miqayitiya li ixtiyaran hin caran serîlêdanan kêr bikin. Bo nimûne, ger pêketina vîrosê li şûna tu lê yan li herêmê hebe.

Em bo şûnên miqayitiya li ixtiyaran û xizman (meriyên ixtiyaran) hevkarîyê pêşniyaz dikin da ku peywendî-girêdan bo te misoger bibe. Heta ger yê ji te nêzik nikaribin werin serîlêdanê, rêyên din bo peywendî-girêdanê hene.

Ji endamên malbata xwe yan ji karmendên şûna xwe bixwaze bila raber te kin çawa dikarî peywendî-girêdana bi vîdyo bikî. Bila raber te kin kengê û li ku dikarî înternêtê bi kar wînî.

6. Dizanî ku dikarî daxwaza mayîna bi malbata xwe re bikî bo demekê, di rewşeke taybet ya dema COVID-19 de?

Ger mayîna bi malbata xwe re, ger dikarin li te binihêrin, bêtehlûketir dizanî, dikarî derçûna dema rewşên ceddî (*emergency leave*) bixwazî. Dema vê êşa berfireh (*pandemic*) rewşeke ceddî ye. Derçûna dema rewşên ceddî (*Emergency leave*) ta heta 30 Hezîran 2021

Bi berpîrsên şûna xwe ya miqayitiya li ixtiyaran re bi xafê ger dixwazî bo demekê ji şûna xwe biçî der.

Me alîkariya te divêt

Appa bi navê *COVIDSafe app* qet ne îcbarî ye. Dikarî bi rêya vê *appê* malbata xwe, dostan û civatê biparêzî. Dikarî bo parastina jiyana yê din alîgir bî. Çiqa bêtir ji australiyayî *COVIDSafe app* daxin mobîlfona xwe, ew qas zûtir em dikarin vîrosê bibînin.

Bo dîtina agahiyên fermî, pêdiviyên û rêberiyê: www.health.gov.au